# HIŞMENDIYA LEYSTIKÊ – KURTENIVÎS – BI GELEK ZIMANAN HEYE

## BI VÎ RENGÎ TÊ BI EWLEHÎ BILEYIZÎ

Gereke leystikên qumarê xweşiyê û heyecanê li cem mirovan peyad bikin. Bi lipeyçûna qaideyên hişmendiya leystikê û bi bikaranîna alavên ku em pêşkêşdikin, tu dikarî bi ewlehî bileyzî.

### Qaideyên hişmendiya leystikê

Em te şîret dikin ku dema tu bi leystikan dileyizî li pey qaideyên hişmendiya leystikê biçî, da ku tu her wext agadarî leystikê bî û ew li jêr kontrola te de be.

1. Pêşwext biryara xwe bide ka heta çiqasî tu dikarî xisarê tehmûl bikî
2. Pêşwext biryara xwe bide tê bikaribî çiqas dem bidî leystikê
3. Pereyên zêdetir liser leystikê xerc meke ji tiştê ku tu hest dikî ku xem nake tu ji malbat û hevalên xwe re bêjî.
4. Bawer meke tê bikaribî xisara xwe vegerînê.
5. Qizinckirina pereyan di leystikên qumarê de bi temamî, yan jî heta heddekî mezin, tesaduf e yan «şens e»
6. Qet pereyan deyn meke ji boyî qumarê

### Leystikên qumarê ji mezinan re ne

Divê emrê te bêhtir ji 18 salan be da ku tu bikaribî li cem Norsk Tipping bileyizî. Lêkolîn didin xuyakirin ku tu çend genc dest bi leystikê bikî, wê metirsiya tûşbûna arîşeyên leystika qumarê jî hewqas mezin be. Li cem gencan pêşketina mêjî hîn temam nebûye, û ji ber vê zarok û genc nikarin metrisiyê bi qasî mezinan teqdîr bikin.

## SERWEXTBÛN Û KONTROL

Em alavan pêşkêşdikin ku wê alîkariya te bikin tu serwextî leystika xwe bî û kontrola te baş liser hebe.

### Sînorên leystikê

Sînorên leystikê alîkariya te dikin tu ji heddê ku te biryara xwe liser daye, tu pere û wextê zêde xerc nekî.

Lêkolîn didin xuyakirin ku sînorên leystikê dihêlin ku tu weku leystikvanê leystikên qumarê serwext bî û kontrol te liser leystikê hebe. Hin leystik xudan wan taybetmendiyan in ku dihêlin metirsiya tûşbûna arîşeyan zêdetir bibe. Di serî de ev ew leystikin ku tu dikarî gelek caran û di demeke kurt de bilîzî, wek nimûne leystikên kazînoyê.

Sînorê sercemî yê Norsk Tippings heddekî dideyne ji pereyên ku tu dikare bixisire re di nava rojekê yan mehekê de di leystikên qumarê de li cem Norsk Tipping. Sînorê sercemî di nav xwe de hemû leystikên ku li cem Norsk Tipping hatine tomarkirin digre, bêyî berçavgirtina ka tu liser tora internetê dileyizî yan li cem wekîlan/li dikanan.

Hin leystik hene ku xudan hin taybetmendiyan in ku metirsiya tûşbûna aarîşeyan ji aliyê leystikvanan ve zêdetir dikin. Eger tu bi van leystikên li cem Norsk Tipping bileyizî divê tu pêşî sînorê leystikê hilbijêrî.

Parçesînor sînoran dideynin ji ka heta çi astî ji sînorê sercemî dikarî bikarbînî di leystikên Belago û Multix, û di leystikên KongKasino, Flax û Bingoria

Hem ji sînorê sercemî re û hem jî ji parçesînoran re sinorê herî bilind yê pereyan heye, û ew sînor jî di qa'ideyên leystikê de hatiye destnîşan kirin.

Sînorê demê (time limit) sînorekê dideyne ji ferehiya dema ku tu dikarî liser leystikê xerc bikî.

Eger tu sînorê demê ber bi jêr ve biguherî, wê sînorê nû yekser bikeve gerê. Lê gere tu sînor ber bi jor ve biguherî, wê sînorê nû piştî demeke libendêmayinê bikeve gerê

## Playscan

Playscan çavdêriya leystikan dike. Eger reftara leystika te were guhertin bi rengekî ku metirsiya tûşbûna aloziyan zêdetir bibe, tê werî hişyarkirin.

Dem bi dem tê hişyarkirinan ji aliyê Playscan ve bistînî.

- Ronahiya kesk: Leystika te misteqir e û metirsî nizm e.
- Ronahiya zer: Şêweyê leystika te metirsiyê çêdike.
- Ronahiya sor: Ev inzareke ji te re ku tirs heye tu tûşî aloziyên leystikê bibî, yan jî tu her tûş bûye.

Zêdeyî vê Playscan te şîret dike kat ê çawa bikaribî şeweyê leystika xwe biguherî da ku nekevî warê leystika ne saxlem û tûşî arîşeyan nebî.

## Bêhnvedan ji leystikê û xwedûrkirin

Hin caran heye ku tu mehtêcî behnvedanekê bî ji leystikê, yan jî mehtêc bî ku tu peşiyê li imkana leystikê yekcarî bigrî.

Gelekî hesaniye tu funksyona bêhnvedanê ji leystikê yan xwedûrkirinê bêxî gerê. Tu dikarî ji leystikekê rojekê yan 7 rojan yan 30 rojan yan 180 rojî bêhnavedanê bistînî. Tu nikarî leystikan teslîm bikî di dema bêhnvedanê de. Tu dikarî di nava bêhnvedana niha de dema bêhnvedanê dirêjtir bikî. Pişti bûrina dema bêhnvedanê tu dikarî careke din bileyizî.

Her wusa tu dikarî imkana leystikê bi yekcarî rakî. Xwedûrkirin herdemî ye, û tê êdî nikaribî wan leystikên ku te xwe ji wan dûrxistiye hilbijêrî.

Tu dikarî bêhnvedanê ji leystikê bistînî yan jî peşiyê li imkana leystikê bi hemû leystikan, yan bi komek leystik yan bi yek leystikê, bigrî.

## Hisabê leystikê

Hisabê leystikê dihêle tu bizanê ka di her wextekî de te çiqas pere xerc kirine.

Hisabê leystikê dide xuyakirin ka xerckirina te ya safî çiqas e. Xerckirina safî ew pereyên ku te liser leystikên qumarê xerckirine piştî birrîna xelatan/qezencê.

- Eger te zêdeyî pereyên ku te razandine qezenc kiribê, wê hejmareke pozîtîv were xuyakirin.
- Eger te pereyên ku te razandine bêhtir be ji pereyên ku te qezenc kirine, wê hejmareke nêgatîv were xuyakirin.

Tu dikarî liser tora internêtê û telefonên mobîl têkevî sîstemê û bibînê ka xerckirina te ya safî çiqas e:

- îro
- Vê heftiyê
- Vê mehê

Tevî vê tê grafekê bibînê ku xerckirina 8 heftiyên dawîn dide xuyakirin.

Digel vê tu dikarî raporeke tefsîlî bixwazî ku wê bide xuyakirin ka di 12 mehên dawîn de te çiqas pere razandine, te çi xelat standine û xerckirina te ya safî çiqas e. Ev raport her wusa dide xuyakirin ka te çiqas pere liser leystikên cuda xerc kirine. Ev raport wê ji navnîşana e-maila te re bê şiyandin.

# ARÎŞEYÊN LEYSTIKÊ?

**Gelo leystikê zora te biriye?**

Gelo tu pê dihesî ku êdî kontrola te liser leystikê dike ji destên te bifilite, yan jî tu goman dikî ku kesekî ku nêzîkî te ye tûşî arîşeyên leystika qumarê bûye?

Kesên ku tûşî arîşeyên leystikê bûne pirê caran arîşeyan ji derdora xwe diveşêrin. Işaretên here asayî ên tûşbûna arîşeyên leystikê – yan jî isaretên ku nîşan didin ku liser te xeter heye - evin:

- Tu pir bi leystikê difikirî, hinavên te daxwaza leystikê dikin.
- Tu hest dikî ku lazim e tu bi pereyên bêhtir û bêhtir bileyizî, û tu zêdetir û zêdetir dileyizî.
- Tu derewan dikî da ku tu veşêrî ka te çiqas dem û pere xerc kirine liser leystikan.
- Tu hewl didî wan pereyên ku tu xisirye careke din vegerînî.
- Tu bawer dikî ku sîsika meselê tenê xwegirtine, û rênedana jidestdayina fersendê.
- Tu «xwexapandinê» bi pereyan dikî û bi wan pereyan dileyizî ku gerek bû liser tiştekî din bihatane xerckirin. Dibe ku te pere deyn kiribin ji boyî leystika qumarê.

**Li vir tê bikaribî alîkariyê wergrî**

Eger arîşeyên te ên leystikê hebin, yan eger tu hin kesan nas dikî ku arîşeyên wan ên bi vî rengî hene, tê bikaribî alîkariyê wergrî. Ezmûn didin xuyakirin ku çareserkirina arîşeyên leystikê netîceyên baş dide. Ji ber vê hindê daxwazkirina alîkariyê gaveke giringe di rêya bidestxistina jiyaneke baştir de.

**Xeta alîkariyê**

Tu dikarî bi telefonê û beyî ku tu xwe bidî nasîn digel Xeta alîkariyê (Hjelpelinjen) liser hejmara 800 800 40 biaxivî.  Yên ku wê pêşwaziya te bikin karmendên dezgeha saxiyê ne ku pisporê arîşeyên idmana leystikê ne. Tu dikarî rewşa xwe bi wan re giftûgo bikî. Her weha Xeta alîkariyê wê şîretan li te bike derbara ka tê çawa jê û bi şûn de daxwaza alîkariyê bikî, û fêrbibî ka çi cûreyên alîkariyê li nêzîkî cihê lêjiyana te hene. Tevê vê tu dikarî peywendiyê bikî digel Xeta alîkariyê bi rêya navnîşana e-mailê: post@hjelpelinjen.no

Dema vekirinê ev e: Di nava heftiyê de ji katjimêr 09.00-21.00.

**Textorê giştî (Fastlege)**

Tûşbûna arîşeyên leystikê yan idmana leystikê teşxîseke ku mafê wergirtina ilacê dide te. Textorê giştî dikare alîkariya te bike û te veguhêze cihekê ilacê. Kesê ku mudminê leystikê ye heye tûşî hin nexweşiyên din bibe, wek nimûne tirs û depresyon, ku gerek e bêne dermankirin. Di vê bwarê de jî textorê giştî weku cihekî alîkariyê yê giring tê hejmartin.

**Dermankirina ji dûr ve**

Dezgehên saxiyê ên giştî bi rêya internêtê ilacê pêşkêşî kesan dikin û ew li mala xwe. Ev ilac pêk tê ji hin erkên ku tê bi rêya internêtê wergrî û ji axiftinên hefteyî bi kesê ku ji ilaca te berpirse re bi rêya telefonê. Ji boyî wergirtina vê alîkariyê veguhestinnameya (ihale) textorê giştî ne gerek e, û ilac belaş e. Ilackirin sê mehan dikşîne.

**Spillavhengighet Norge (Idmana leystikê li morwêc)**

Spillavhengighet Norge rêxistineke leystikvan û xwediyan e ji boyî wan kesên ku bi xwe tûşî arîşeyên leystikê bûne yan jî xizm û ehlên wan hene ku tûş bûne. Li bajarên mezin rêxistina Spillavhengighet Norge axiftinên komî pêşkêş dike, û her wusa alîkariyê bi rêya telefonê 477 00 200 pêşkêş dike. Xeta telefonê vekiriye ji roja duşembê – pêncşembê ji katjimêr 10.00 – 14.00.

**NAV**

NAV (Birêveberiya kar û jiyanxweşiya civakî) şîretkirinê derbara deynan de pêşkêş dike. Beyî ku tu xwe bidî nasîn, tu dikarî bi telefonê digel hejmara 800 45 353 biaxivî û liser rewşa xwe bi NAV re biaxivî. Her wusa tu dikarî peywendiyê bikî digel fermangeha NAV

ya herêmî û daxwaza civanekî li cem şîretkarê deynan biki. Zêdetir liser vê mijarê di vê malperê de bixwîne: https://www.nav.no.